## Poz bilindiya desthildarên Komara Îslamî erdê girt

Herçawan ku behs dikin di sedsala 17`an a Zayînî de dema ku Wiam Harwi gera xwînê di nav laş de peyda kir û ji cîhanê re ragihand ku dil mîna pompekê ye û bi alîkariya çend boriyan yan heman demaran xwînê pal dide hûndrî laşê mirov de.

dom»R:8



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (465)06-03-2024 Buha (1000) Tûmen*

## Pirsgirêkên girêbesta civakî di civaka Urmiyê de

Girêbesta civakî di Rojhilata Kurdistnê de bi giştî, di herêma Bakûrê Rojhilatê Kurdistanê û bi xasma bajarê Urmiyê de, bi sedema dagîrkariya Îranê û cihêrengiya xelkê hêşta xîmê wê livok e nekariye hemû qetên civakê bi hev ve girêbide.

dom» R:9

## Ew nikarin mafên me bistînin e8'ê Adarê roja rêzgirtina ji

8'ê Adarê di sala 1857'an a Zayînî de bi hilkevta Xwenîşandana mezin a Karkerên Jin ên li Karxaneyekî Karkeran li Amerîkayê hate gorê. Di sala 1977'an a Zayînî de bi pêşniyara xebatkara jin Clara Ztkin, Neteweyên Yekbûyî Roja Jinan a Cîhanê ragihand.

dom» R:10

# Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê: Dîsan jî dengê bilindê "NE" ya xelkê bi ser tevahiya îrade û desthilata rêjîmê de serkevt




Xelkê Xebatkarê Kurdistanê!

Civaka azadîxwaza Îranê!

Welat û kom û civatên cîhanî!

Komara Îslamiya Îranê roja Înê 11ê Reşemê, girîngtirîn binav hilbijartina temenê desthilatdariya xwe ku ew jî li rewşekî hestiyare siyasî û civakî a welat de bi rê vê bir. Ew binav hilbijartina ku salek û çend heyv piştî şoreşa Jîna yê û çend heyv piştî qonaxa nû ya qeyrançêkirinên rêjîma Îranê ku li deverê de çêkirinî, bo komara Îslamî ya Îranê girîngî û bihayeke yekcar zaf ji mulê bi destxistina rewatiya xwe a nemayî û herwisa zivirîn bo rewşa aliyê kêm a berî heyva rezbera 1401 a Rojî, hebû. Lewma ji vê pêde li encama hilbijartinan û rêjeya beşdarbûna xelkê ku ji heftiyên berî 11ê Reşemê bi rapirsînên curbicur, amadehiya hizrî bo sextekarî û çêkirina amaran direvîn, nîşandana çawatiya çona xelkê bo ser sindûqên dengdanê li ser şaşeya kamêrayên wan, bo wan servetir ji hemû tiştekê bû.

dom» R:2

## Mistefa Hicrî: bê pênasekirina pirsa serwerî, êdî nebe fikrê ji bihevrejiyana dixwaz bikin

Deqa gotara Berpirsê Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat li simînara "Îran ji dîêtingeha Kurdan, rewşa Rojhilatê Kurdistanê û paşeroja Kurdan li Îranê de" li parlemana welatê Danmarkê:

Li destpêka sedsala bistê ve bi avakirina dewletnetewyên serdest, pirsa netewî û pirsa dêmokrasî yê li cografiyaya Îranê, wek 2 pirsên bingehîn, hatine piştguhavêtin. Ev 2 mijar jî pirsa bingehîn a netewên jêrdest bûye.

dom» R:6

## Mistefa Hicrî: Pêşeroja serkevtina xelkê bi ser rêjîma Îslamî de li hemû demekê nêzîktir û berçavtir e

Îşare: Rêjîma Komara Îslamiya Îranê li 22ê Rêbendana Îsal de 45emîn salvegera desthilatdariya xwe bi rê ve bir û dixwaze li 11ê Reşemê de bi birêvebirîna hilbijartinên meclîsa Şêwreya Îslamî û meclîsa Xubreganê rehberî, him rewatiya çewt bo xwe wergire, him bi endazyarîkirina wan 2 navendên hikûmetî, binyata desthilata xwe qahîm bike. Tevê kirîzên navxweyî yên liserhevkombûyî, komara Îslamiya Îranê li alozkirina deverê de bi serê mar tê naskirin û zêdetir ji her demekê kirîzçêkirinên vê rêjîmê, deverê rastî alozî û şer kiriye.

dom» R:3

# Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê: Dîsan jî dengê bilindê “NE” ya xelkê bi ser tevahiya îrade û desthilata rêjîmê de serkevt




**Xelkê Xebatkarê Kurdistanê!**

**Civaka azadîxwaza Îranê!**

**Welat û kom û civatên cîhanî!**

Komara Îslamiya Îranê roja Înê 11ê Reşemê, girîngtirîn binav hilbijartina temenê desthilatdariya xwe ku ew jî li rewşekî hestiyare siyasî û civakî a welat de bi rê vê bir. Ew binav hilbijartina ku salek û çend heyv piştî şoreşa Jîna yê û çend heyv piştî qonaxa nû ya qeyrançêkirinên rêjîma Îranê ku li deverê de çêkirinî, bo komara Îslamî ya Îranê girîngî û bihayeke yekcar zaf ji mulê bi destxistina rewatiya xwe a nemayî û herwisa zivirîn bo rewşa aliyê kêm a berî heyva rezbera 1401 a Rojî, hebû. Lewma ji vê pêde li encama hilbijartinan û rêjeya beşdarbûna xelkê ku ji heftiyên berî 11ê Reşemê bi rapirsînên curbicur, amadehiya hizrî bo sextekarî û çêkirina amaran direvîn, nîşandana çawatiya çona xelkê bo ser sindûqên dengdanê li ser şaşeya kamêrayên wan, bo wan servetir ji hemû tiştekê bû.

Komara Îslamî ku berê bi rêya handana berbijêran li şêwreya Nigehban de hilbijartinên zêdetir ji caran jî li naveroka xwe betal kiribû, lê hemû cehd û şiyana xwe bi armanca rêkxistinkirin û germkirina rikeberî ya binav hilbijartin û rakêşana hejmareke zêdetir ji xelkê bo ser sendûqên dengdanê, bi rê xist. Beşek ji wan cehdên rêjîmê ew bûn:

Handan û tûjkirina xelkê bi du alîkirina hilbijartinan li hemû bajar û deveran bi şêwaza li berhev sekinadin kesan an mifahvergirtin ji pirsên curbicur ên zimanî, olî û netewî, xerckirineke bêhejmar bo berbijêran bo destvekirîbûna zêdetir bo kirîna dengan û banghêjiyan, pêkanîna rewşeke demkî ya vekirî bo axaftinên armancdar, bikaranîna hemû îmkanatên dewletî û hikûmî û erkdarkirina hemû organên îdarî û leşkerî bo gerimkirina rewşa hilbijartinan, xistine berbasa hejmarek ji mijarên netewexwazî û mifahvergirtin ji wan mijaran, li berxwegirtina hemû rêkarek bo hêsankarî li dengdanê de wek mînak piştguhavêtina mohrkirina nasnamê ku li hemû hilbijartinên berê de xelkê bo xwendinê li zanîngeh, karpêdan û berdewambûna wan li karên îdarî de pê ditirsandin.

Rêjîmê hevterîb digel siyaseta handan û tûjkirinê, sînorên bi teklîf hesibandin û erkên olî jî derbas kirin û cehd dikir bi tirsandina xelkê bi rêya gotarên siyasî li hemû astan de heta çend caran ji zimanê “Elî Xamineyî” yê rêberê rêjîmê û piştre şandina kurte peyam bo xelkê bo beşdarînekirin bi wateya dijayetîkirina eşkere digel Îslam û rêjîmê bidin xuya, ku bi wan gefxwarinan renge hinek xelk here ser sindûqên dengdanê. Lê ne siyaseta handan û lahîkirinê, ne tîxa gef û tirsandin, û ne ti fêl û sinaryoyeke din nekarî ji nîşandana îradeya yekgirtin û xebatxwaziya xelkê Îran û Kurdistanê bi taybet li dijî rêjîma Îranê û gihandina helwîst û peyama siyasiya xwe nebi tenê bi rêjîmê, belkî bo civatgeha cîhanî jî rêgiriyê bike.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê pîrozbahiya serkevtina îradeya xelkê Kurdistanê li hemaseya 11ê Reşemê li hemû qatên civaka mafxwaz û xebatkarê Kurdistanê dike ku bi baykotkirina binav hilbijartinê, tekezî li ser xebata mafxwazaneya xwe kirin û herwisa lerzokbûna sitûnên desthilatdariya rêjîma Îslamî û bêpêgehbûna vê rêjîmê bi taybet li Kurdistanê, dane xuya.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê tevî şandina silav û rêz û pêzanîn bo pitira herî zêde ya xelkê Kurdistanê ku bi neçon bo ser sindûqên dengdanê, berevanî ji maf û azadî û daxwaziyên netewiya xwe kirin, pêzanîn bo wan berbijêrên ku piştî belavbûna daxuyaniya Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat bi baykotkirina hilbijartina, ji rikeberiya banghêjî û hilbijartinê paşve kêşan.

Hizba Dêmokrat rola hemû Hizb, alî û kesayetiyên siyasî, rewşenbîrî, olî û akademîk bi bilind dinirxîne ku li serkevtina baykotkirin a hilbijartinê de çalak bûn. Herwisa bi taybet spas ji bivêrî û helwîsta hişmendaneye jinên netirs û azadîxwazên Kurdistanê dike ku tabloyeke zindî ya din ji îradeya şoreşa “Jin Jiyan Azadî”yê û pêşengatiya xwe li vê xebatê de dane xuya. Herwisa silav û mandînebûn li hemû endam û alîgirên Hizba Dêmokrat dikin ku li vî heyamê de bi bivêrî, erkvergirtina bê mînak li belavkirina siyasetên ragihandî û gotara Hizba xwe, Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li serkevtina baykotkirin a hilbijartinê û bidestxistina wan destkevtên xebatkarane de çalak bûne.

Civatên Xelkê Kurdistanê!

Erk û birêvebirin û xebat û mafxwaziya we piştî 11ê Reşemê, pê dihavêje qonaxeke nû û ji qonaxa baykotkirina binav hilbijartinan ve derbas dibe û li baykotkirina berdewam a rêjîmê li hemû waran de berdewam dibe.

We careke din bi helwîsta hişyarane û têgihîştina siyasî û bivêrî li kiryar de û bi dengê bilindê “NE”yek li hestiyartirîn demê de gote rêjîmê û bi serkevtin bi ser îradeya rêjîmê ku bi hemû hêz û şiyana xwe bo danîna aliyên binav hilbijartinê bi rê xistibû, We karî nîşandaneke zindiye din ji hemaseyeke pir şan ji yekgirtin, pêkvebûn û hevhelwîstiya xebatkarane biafirînin.

We careke din bi welat û civaka cîhanî da selimandin ku rêjîma çêkerê qeyranan û şerxwaza komara Îslamî, ku aramî li deverê têk daye, li navxweyê welat de çende bêçare û şikestxwarî ye û binyat û payeyên vê rêjîmê heta çi astekê sist û rizî bûne û hewce ye ku micidtir, deng û îradeya xelkê Îranê bo derbasbûn ji vê rêjîmê bibhîzin û pişta xebata mafxwazaneya Xelkê Îranê bigrin, Lewma yekgirtin û hevhelwîstiya we û meydandariya bi kiryar a we li xebat û tekoşîn û “NE” gotin bi komara Îslamî, ew erk û berpirsayetiye bo hizbên siyasî û opozîsiyona komara Îslamî çê dike heta bi hêjatî û pêdegirane, destkevtên 11ê Reşemê ya xelkê Îranê bikin binyata hevpêwendiyeke seranserî û binyata alternatîvek bo derbasbûn ji komara Îslamî.

Bi hêviya vê yekê ku piştî hilbijartina 11ê Reşemê, bi yêkîtiya bi kiryara zêdetir, xebat û tekoşîna hemû aliyan a me bo serkevtina yekcarî bi ser rêjîma komara Îslamiya Îranê de micidtir û bi gurtir bibe.

**Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**12ê Reşemeya 1402 a Rojî**

# Mistefa Hicrî: Pêşeroja serkevtina xelkê bi ser rêjîma Îslamî de li hemû demekê nêzîktir û berçavtir e

**Hevpeyvîn. Elî Budaxî**
**Wergêran. Bêhzad Simko**



Îşare: Rêjîma Komara Îslamiya Îranê li 22ê Rêbendana Îsal de 45emîn salvegera desthilatdariya xwe bi rê ve bir û dixwaze li 11ê Reşemê de bi birêvebirîna hilbijartinên meclîsa Şêwreya Îslamî û meclîsa Xubreganê rehberî, him rewatiya çewt bo xwe wergire, him bi endazyarîkirina wan 2 navendên hikûmetî, binyata desthilata xwe qahîm bike. Tevê kirîzên navxweyî yên liserhevkombûyî, komara Îslamiya Îranê li alozkirina deverê de bi serê mar tê naskirin û zêdetir ji her demekê kirîzçêkirinên vê rêjîmê, deverê rastî alozî û şer kiriye.

Hilsengandina wê rewşê ji dîtingeha Hizba Dêmokrat, rojeva siyasiya Îran û Kurdistanê û dûredîmena xebat û rawestana xelkê li hember komara Îslamî, çend qonaxên gotûbêja "Kurd Kanal" digel Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê rêzdar "Mistefa Hicrî" bûn.

**P.** Rêzdar "Mistefa Hicrî", şiroveyên Hizba Dêmokrat bo ser rewşa niha ya Rojhilata Navîn, bi taybet piştî bûyera 7ê "October"ê, çîye? Rêjîma Îranê li çi pêgeheke wan dijayetiyan de ye û karlêkeriya vê rewşê li ser pirsa Kurd bi taybet li Rojhilatê Kurdistanê çawaye û dê çi bibe?

**B.** Mistefa Hicrî: Rojhilata navîn ji mêjve tejî pirsgirêk û dijayetiyan e, pirsgirêkên eşîretî, olî, gendelî, xoseriyên siyasî û tevahiya wan diyardeyan li dijî berjewendî û qazanca rûniştiyên deverê, berdewam in. piştî 7ê "October"ê ve ku bi êrîşa Hemas bo ser Îsraîlê û tolhildanên Îsraîlê ve dest pêkir û em dibînin ku niha bûye karesateke mirovî; welatên li deverê gelek nigeranên rewşa pêşhatî ne, Li rasitiyê de civaka cîhanî dixwaze wî şerî bi dawî bîne û Îsraîl li tenişta welateke Felestînî bi fermî bê naskirin û her 2 alî bikarin bi aramî û aşitiyê li ciranetiya hev de bijîn, lpê sedem zor in ku ew rêçareya serî negre ku pêş hemûyan de komara Îslamiya Îranê ye. Çimkî Komara Îslamiya Îranê bi eşkere dibêje ku Îsraîl welatekî sexte ye û divê ji nav here.

Bilî vê yekê ku Hemas perwerdeyê destê rêjîma Îranê ye û çek û diraf û hewcehiyên vê ji aliyê vê rêjîmê ve tê dabînkirin, ew jî li ser vê bawerê ne ku divê Îsraîl ji nav here.

Lewma li rastiyê de binyata vê yekê ku welatekî serbixwe yê Felestînî li tenîşta Îsraîlê de bê avakirin bo vê ku ew pirsgirêkane bo yekcarî çareserbibin, dûredîneke gelek nêzîk nîne, bi taybet hekî me bi hûrî mêze kiribe, niha li Îsraîlê de jî aliyê destê rastî li ser desthilatê ne û ew jî bi ti awayekê heta niha amade nebûne vê rêçareyê erê bikin.

Lewma sedema vê ku ew şere dê demdirêjtir bibe û li şêwazên curbicur de berdewam be, zor in û ya ku Îranî li kîêdera vê pirsgirêkê de ye, dikarin bibêjim ku Îran bingeha vê kêşeyê ye.

Çimkî pirsa Îsraîl û jinavbirîna dewleta Îsraîl, yek ji îdeolojiyên vê rêjîmê ye û milîsên ser bi vê rêjîmê jî ku pêk aniye û salên dûr û dirêj e amade dike, wek Hizbullah a Lubnanê, Hemas, Hûsiyên Yemenê, ew jî niha bi şêwazekê li şerê li dijî Îsraîlê de beşdar in.

piştî derbasbûna çend hevan ji destpêkira vî şerî em dibînin ku heta niha hêzên Îsraîlê hejmareke berçav ji wan kuştine, bi 10an hezar ke sji xelkê Xezê têdeçone û hejmareke gelek zêde jî birîndar bûne û welatek ku hatiye kawilkirin; Lê Komara îslamiya îranê li rastiyê de bilî çend kes ji fermandeyên ku bi sedema êrîşên Îsraîlê ve hatine kuştin, ti xisareke din pêneketiye; Lewma Komara Îslamiya îranê heta berjewendiyên vê bixwazin wî şerî demdirêjtir dike.

**P.** Kêm nînin ew kesên stratejîst û çavdêrên siyasî ku bi hizra wan piştî 7ê "October"ê nezma cîhanê û xerîta siyasiya welatan û Rojhilata navîn wek çeqa wan bûyeran, nêzî guherîna binyatî ye. Bi hizra te yê rêzdar vê yekê bo pirsa Kurd li Rojhilata Navîn de bi derfet dibînin an gef?

**B.** Mistefa Hicrî: Li destpêkê de ku şer qewimî, ew guman bi hêz bû ku guherîneke kûr li pey tê, lê niha ku heyameke nêzî 5 heyvan e ji destpêka şer derbas dibe, ew yek ku him bi axaftin û him bi kiryara komara Îslamiya Îranê û li Îsraîlê bi xwe de û li Amerîkayê jî ku piştevanê yekem ê Îsraîlê ye, ji wan hemûyan me bihêstiye û dîtiye ku hemû hewlên xwe didin şer berfirehtir nebe û welatên din tûşî şer nebin.

Ev keka jî ku Hemas, Hûsî an hinek ji milîsên ser bi rêjîma Îranê li Îraqê de beşdariyeke kên li avêtina diromn û mûşekan kirine, lê ti yek ji wan nabin sedem ku ew şere berfirehtir bibe; Çimkî Komara Îslamî ji vê yekê ditirse li rengehiya berfirehtirbûna şer de derbên giran bi rêjîmê bikevin û li nihade bi ti awayekê amadehiya wî şerî nîne û şiyana bi pêşxistina şer jî nîne. Lêbelê bo Îsraîlê jî karek bi zehmet e ku ji vê zêdetir şer berdewam be, hêzên Îsraîlê westiyane û hewlê dide bi vê şêwazê bimîne. Heta tê gotin ku renge li heyva Remezanê de şer bi dawî bibe, lê hewce ye çavrêbin û bizanin ku gelo Îsraîl dê li wî şerî de heta şê astekê bi mecên ku danînê dê bi dest xwe ve bîne, lê bi giştî ez wa hizir dikim ku metirsiya berfirehtirbûna wî çerî bi awayekê ku welatê îranê bi tewahî tûş bibe û îsraîl eniyeke din a şer zêde bike, bi zehmet dibînim.

**P.** Kak Mistefa, çend rojan berî niha, komara îslamiya îranê 45emîn sala desthilatdariya xwe derbas kir, li vê derheqê de dipirsim, destkevt û xisarên şoreşa 57 bo xelkê Îranê çi bûn?

**B.** Mistefa Hicrî: Bi hizra min, destkevtek wiha nîne ku li ser biaxivin, lê xisarên vê bêsînor in. Beşek ji wan qeyran û xisaranejî ku em dibînin, hêj dimikê çiyayê bûzê ye û ew beşa ku xua nîne û heta renge heta herifîna rêjîmê jî ne bo xelkê Îranê û nebo cîhanê neyê xuya ku aliyê wê xisarê ku ji warê jîngeh û mirovî ve li Îranê kevtiye çende zaf û mezin e.

Li warê destkevtê ve jî ew şoreşa neku ti destkevtek he nebûye, belkî hekî berê xelkê Îranê li serdema "Mihemedrizaşah" de bi xebat û tekoşînên xwe karîbûn hinek maf û destkevtan bi dest xwe ve bînin, ew

dom»» R:4

# Mistefa Hicrî: Pêşeroja serkevtina xelkê bi ser rêjîma Îslamî de li hemû demekê nêzîktir û berçavtir e

doma» R:3

destkevt û maf jî ji dest çobûn. Wek mînak li warê mafê jinan, kêmîneyên olî û geklek warên din ên komelatî de ku komara Îslamî ew bi tevahî ji çengê xelkê derxistine

**P.** Lê gelo tu yê rêzdar erê dikî ku bibêjin renge take destkevta vê şoreşê, herîfandian rêjîma paşatî bû, lê bi armancên vê şoreşê ku dabînkirina hejmarek ji mafan bû negihîşt?

B. Ez bi xwe nav û nasnavê hikûmetan bo min gelek girîng nîne, girîng naveroka vê ye. Hikûmeta paşayetî dikare dêmokratik an dîktatorî be, ev yeka niha jî li gelek cihên cîhanê de em dibînin, lewma Komarî jî her bi wî awayî ye. Komara Îslamî xwe bi hikûmeteke komarî dizane lê bi nîşanek ji komariyê, îradeya xelkê û hevparbûna xelkê li vê hikûmetê de nayê dîtin. Lewma tenê bo vê yekê mku hikûmeta Şah herifî û hikûmetek li jêr navê komarî cihê vê girt, bi derstkevt nizanim.

**Raste ku rêjîma Pehlewî jî azadî berteng kiribûn û azadîxwaz serkut dikirin û bi rastî xelkê Îranê şaş nebî ku serhildan kir, lê armanc ji herîfandina rêjîma Pehlewî ev nebû ku hikûmetek wek ya niha bibe desthilatdar. Xo hekî piştî serkevtina şoreşê hate qebûlkirin ku bhikûmeta Îslamî bibe şêwaza desthilatdariyê, li rastiyê de ti kesê ti ceribandineke vê nebû. Renge take destkevt li vê şoreşê de ev yeka be ku xelkê Îranê hikûmeta paşatiyê dîtibûn, hikûmeta Îslamî jî ceribandin û dikarinm bibêjim ku li vê pêde ti hikûmeteke îdeolojîk li Îranê de êdîû nabînin.**

**P.** Pişka Kurd li Îranê ji 45 sal desthilatdariya komara Îslamî çi bûye?
B. Li rastiyê de bi hatineserkara komara Îslamî, tevahiya xelkê Îranê zirar dît, lê ew xisara ku bi kurd kevtiye û qurbanîdanên xelkê Kurd li pêvajoya xebat li dijî rêjîma Îslamî, gelek zêdetir ji ya beşên din ên Îranê ye. Wek mînak tenê li heyama salekê



ya tevgera "Jîna"yê de herî kêm 497 kes li xwenîşandanên nerizayetiyê de hatine kuştin ku 148 kes ji wan, Kurd bûn ku ew rêjeye ji Kurdên ku hatine kuştinê bi berçavgirtina heşîmeta Kurdistanê li Îranê, gelek zêde ye.
Li girtin û îşkencedan û tepeserkirina xelkê, bêparkirina wan ji bûdceyya giştî, parêhiştina Kurdistanê li avedanî û geşeya aborî, li cudatîdanîneke gelek bi eşkere de li navbera Kurd û netewên din de neku her yên ku li yasaya bineretî de bi fermî hatine erêkirin, belku ji vê zêdetir, bi neyasayî jî cudatî tê danîn; pêka gelek fakteran, kur ji jiyan û xisarên hatineserkara desthilata komara Îslamî, zêdetirîn beş berketiye pêka gotineke Kurdî, pişka şêr li ber Kurd kevtiye. Helbet sedema vê jî bi vê yekê re girê didim ku ji destpêka hatinaserakar a Komara Îslamî ve heta niha jî Kurd bi awayekî pêdegir û bi bê dudilî, li dijî rêjîmê xebat kiriye û ew xebat tekoşîne, berdewam kiriye.

Li bîra me de ye ku serdemekê, hinek ji xelkê Îranê wêneyên Xumêynî li ser heyvê ditîdin û teqedusek esmanî pêdabûn û bi vê curê hate ragihandin ku li rifrandonê de %98 a xelkê îranê deng bi komara Îslamî ya Îranê dan, lê Kurd deng bi rêjîmê neda û çepera xebatê hilbijart, çimkî dizanî ku rêjîmek bi vê naverokê nikare azadiya gelan li Îranê û mafên mirîvî, dabîn bike. Lewma xebata xwe berdewam kir û roj bi roj jî ew xebata him aliyên zanyarî û hişariya pitir li xwe girtiye û him jî tundajotir bûye ku me ev yeka li tevgera "Jîna"yê de dît.

**P.** Li çend rojên bê de, komara îslamiya Îranê, hilbijartinên meclîsa şêwra û meclîsa Xubregan li bi rê ve dibe, girîngiya vê hilbijartinê bo komara Îslamî li çiye de ye? Gelo ew hindeya ku bo rêjîmê girînge, bo xelkê jî ew yek wisa ye?

**B.** Nexêr ew hilbijartinane bo xelkê girîng nînin, çimkî êdî niha cudatiya li navbera rêjîm û xelkê, gelek mezin bûye û rewşek wiha hatiye pêş ku her çi qazanc û berjewendiya rêjîmê be, ew li dijî berjewendiyên xelkê Îranê ye û herwisa bervajî jî her wisaye. Eva ku komara îslamî cehdê dike şanoyeke hilbijartinê bi rê ve bibe, li rastiyê de tenê bo parastina qewareya ku navê Komariyê li ser daniye ye û dixwaze bi taybet li civaka cîhanî de bibêje ku li Îranê de hilbijartin tê kirin û xelk nûnerê xwe hildibjêrin û xelk li pişta vê rêjîmê ye.

Dixwaze komek ji xelkê li ser sendûqên dengdanê kom bibin ku ji çavê kamêrayan ve bêde nîşandan ku xelk rewatiyê bi vê hikûmetê didin û li vê de beşdar in. Nekû bi pêka ideolijiya oliya xwe, ev hikûmeteke esmanî ye ku li ser kar e û xelk tenê erkê wan e ku fermanên wan bi rê ve bibin.

Ew demûdezgehên jî ku danîne ku yek ji wan meclîs e, li rastiyê de tenê bo fermîtiyê bide wan biryarên ku li serweyî meclîsa şêwreya îslamî têne dan, bi atybet ji aliyê welî feqîh ve. Tenê bo vê ku biryarên wan rûkê yasayî li xwe bigre û bi ser xelkê de bê sepandin. Lewma ew hilbijartinên ku binav hilbijartin in û hilbijartiya xelkê nîne, hilbijartina hikûmetê ye. Hikûmet nûnerê xcwe hildibjêre û nûnereke xwe jî li pêşde li navendeka din de a bi navê şêwreya Nigehban hilbuijartine û danîne ber çavên xelkê heta xelk li nav wan de hilbijêrin û tevahiya kesên ku têne hilbijartin, nek hilbijartiyê xelkê nînin, beku hilbijartiyê rêjîma siyasî ne.

**ji aliyê din ve jî berpirsên serve yên rêjîmê, bi ti awayek neveşartine ku dengê xelkê bo wan ti girîngiyek nîne. Li bîra me de ye ku heyamek berî niha ku bas ji rifrandomê hatibû kirin, Elî Xamineyî li civînekê de bi eşkereragihand ku ma xelkê îranê hinde têgihîştin û şirevekarî hene ku ku bên û li rifrandomê de beşdar bin? Pêştir jî bo mînak, dema ku Ehmedînijad bo dora 2yê bi sextkariyan li posta vî de hate danîn û xelk hatine ser şeqaman û wan xelk bi "Xes û Xaşak" biav kiribûn.**

Bi kurtî, rêjîma komara Îslamî ti hewcehiyek bi dengê xelkê nîne, çimkî bawera wan ev e ku hilbijartiyê esmanan in û xelk divê gotinên wan cîbicî bike, lewma nabe xelkê li vê hilbijartinê de beşdariyê bike, çimkî hekî beşdar bin, xizmetê bo pêşxistina vê îdeolojiyê kiriye û temenê wan karestan dirêjtir kiriye ku heta niha her li jêr çavdêriya vê cure meclîsê û vê şêwreya nigehban û demûdezgehên din de qewimîne.

Xuyaye ku ev yeka jî heye ku rêjîm li warê ku xelk zêdetir beşdarbin, ji hilbijartinên berê jî girîngtir e. çimkî ji aliyekê ve li tevgera "Jîna"yê ve, xelk bi tevahî axaftinê xwe rû bi navenda biryardan anku Xamineyî kirin û dirûşmên herifandina rêjîma Komara îslamî dan. Lewma bo komara Îslamî, girînge ku niha bi awayekê bide selimandin ku rewaiya desthilatê her li cihê xwe de maye û ji vê yekê jî gelek ditirsin û dizanin ku beşdariya xelkê dê gelek kêm be.

**P.** Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, Hilbijartin baykot kiriye? Bo bi hizra we bi taybet xelkê Kurdistanê nabe

dom»» R:5

doma» R:4

beşdarî li hilbijartinan de bike?
**B.** Mistefa Hicrî: Herwekî min pêştir baskir, ew hilbijartinane, hilbijartina nûnerên xelkê nînin, belku ew hilbijartiyê wan kesan in ku li meclîsa rêjîmê de biryarên rêjîmê bi ser xelkê d ebisepînin. Lewma dema ku hilbijartina nûnerê xelkê nîne, xelk jî nabe beşdariyê bike.

Bilî vê ku li binyatê de dengê xelkê li vê sîstemê de ti karlêkerî û bandorek nîne û bo xelkê jî ev yek derkevtiye û li li ser vê baweriyê ne ku nabe beşdar bin. Lewma xelk nabe beşdarî li vê dengdanê de bike, heta hekî biryar be dengê betal jî bidin, her nabe herin ser sendûqên dengdanê bo vê yekê ku nebin bi elava propagandaya rêjîmê û şanogeriya vê.

**P.** Kak Mistefa, hekî mijara hilbijartinê I cih bihêlin, şoreşa "Jîna" wek xaleke guherîn li dîroka neroizayetiyan de li dijî rêjîma Îslamî, çi paşerojek xistiye pêş xelkê û hizbên siyasî? Şiroveya te bo rewşa niha ya Îran û Kurdistanê bi taybet piştî .oreşa "Jin Jiyan Azad"yê, çiye?
B. Xuya ye ku li destpêka hatineserkar a Komara Îslamiya Îranê ve heta niha, xelkê pêngaw bi pêngaw ji vê rêjîmê şareza bûne û hêzî hêdî ji paşve çone û jê dûr kevtine. Xo hekî heta tevgera "Jîna"yê jî hejmarek kes hebûn ku bi bawera wan dibe ku ew rîjîme li navxwede bê rêformkirin, an dema ku rêjîm li nav aliyên ser bi xwe de du alî çêdikir bo vê yekê ku xelkê bo ser sendûqên dengdanê rabikêşin anli wan cihên ku pêkhênerê heşîmeta wan netewên din bûn, hinek mijarên din û tûjkirina xelkê bo beşdarîkirin li dengdanê, ew bi dawî ahtiye.

Li heyama çend salên derbasbûyî de dikarim bibêjim ku rojane li çendîn bajarên Îranê de xwenîşandan hatine kirin, xelk ji hemû qat û çînên civakê nerzî ne. Lê yek ji taybetmendiyên şoreşa Jînayê ew bû ku tevgera xelkê ji vê hewmên "Îslah Telebî" derxist. Xelk yekdest û yekparçe bû û ew peyam da ku ew qeyran û karesatên ku bi ser xelkê Îranê hatine, tenê bi nemana rêjîmqa Komara Îslamî bi dawî têt lewma xelk serê qûçikê kire armanc û me dît ku li tevgera "Jîna"yê de sembolên rêjîmê anîne xwarê û şikandin û agir berdanê.

**Pirs ev e hekî berî tevgera Jînayê li dilê xwe de li dijî rêjîmê bû, lê bi eşkere û rohnî li ser herifandina rêjîmê û Xamineyî, nediaxivî; Lê li tevgera Jînayê de êdî ev yeke nema. Tevgera Jînayê him bo xelkê îranê û him bo xelkê cîhanê da selimandin ku bi tenê bi nema rêjîma Îranê guherîn bo qazanca xelkê bi destve tê.**

P. Kak Mistefa, şoroveya ve bo vê şêwaza xebat li navxweyê Kurdistanê çiye? Eva ku me li biaxsipartina sl çiyagerên Nexedê û werzişvanê xelkê Seqîzê dît, eva rojane li tekoşîna çalakvanên siyasî, medenî û cikakî em dibîbin?
**B.** Bi hizra min, tevî ku ew şêwaza xebatê binyatek heye û berê jî li navxweyê Kurdistanê de qewareyek li xwe girtibû, lê tevgera "Jîna"yê ew bihêztir kir, bi vê wateyê ku bi xelkê da nîşandan ku xelk divê li hemû bûyeran de yekparçe û yekdeng be.

Xelk gihîêştiye vê encamê ku tinê bi xwe bi hawara xwe ve bê û berî vê ku çavê wî li welatên derve be ku bên û rizgar bikin an her hêzeke din alîkariya wan bide, divê bi xwe yekgirtî be. Me îsal li Kurdistanê de ev yeka li çendîn bûyeran de ku te îşare bi wan kir, dît ku berê jî mînakên hiha wek mînak li erheja Kirmaşanê a bûyerên din ên parastina jîngehê de dûtibû.

Bi hizra min, ew binirxtirîn wane û ceribandin bû ku xelk fêrbûne ku vê rêya nû ku bi xelkê daye nîşandan, divê ji niha pêde bo guhîştin bi armancê xwe, vê rêyê bernedin p roj bi roj zêdetir pêwendiyên xwe bihêztir û bişiyantir bikin.

**P.** Wek kobenda baskirinanên me û dawî pirsyar, Kak Mistefa bi hizra ve li rewşa niha û li qonaxa nû ya xebat û rawestan li hember komara Îslamî de erkê xelkê, erkê rêkxiravan, erkê hizbên siyasî an bi giştî xerîta xebata niha û paşeroja me çiye?

**B.** Herwekî min baskir, niha piştî 45 sal xebat li dijî komara Îslamî, xelkê Îranê ji vê wehmê û dudiliyê derkevt ku rêjîma Îranê dive linavxwede bê rêformkirin an bi qazanca xelkê biguhere. Niha xelk bi yekdengî dibêjin ku ew rêjîme divê here û komara îslamî bi xwe jî ew peyame vergirtiye.

Lewma bi qasek ji xebata xelkê li navxweyê welat de ditirse ku bi hemû awayekê mijîlê serkutkirina xelkê ye. Em dibînin ku li binçavkiroinan, îşkencedanan û çendîn curên serkutkirinê ku tenî bi aqilê seqet ên rêjîmê digihîje ku digel xelkê bike, wek eva ku li tevgera "Jîna"yê de me dît ku zarokên dibistanan jehrxwarî dikir û gelek tiştên din ku li wir bas nakim.

Pirs ev e ku xelk ev rêya li pêçiya xwe girtiye û ev rêbaze dibe berdewam be û nabe bisekine. Hekî niha hemû çanaziyeke rêjîmê bi vê yekê ye ku mûşek hene û bi vê cîranên xwe ditirsîne, dixwazin vê peyamê bo xelkê Îranê bi taybet xelkê xoşewîst û têkoşerê Kurdistanê bişînin ku ewane ti nîşanek ji bihêzbûn û xwedî şiyanbûna vê rêjîmê nînin, belku bi tevahî nîşana tirsîna komara Îslamî ye û komara Îslamî kevtiye tana canê xwe û dawî cehdên zindîmana xwe dide.

Rêberên komara Îslamî her bi xwe bi başî dizanin ku heta çi astekê bikêrnehatî ne û tenê li hember xelkê de bi tepeserkirinê, xwe bihêz didin xuya. Çimkî niha komara îslamî digel tevahiya vê yekê ku îsraîl li Xezê de li dijî Hemasê dike û mijûlê jinavbirina yek ji milîsên rêjîmê ye, lê komara Îslamî li vê rewçê de jî ew bivêrî nîne ku bi awayê rasterast tevî şer bibe.

Çimkî dizane nikare li hember bisekine û piştevaniya xelkê jî bo nemaye, lewma tevî ku hemû karesat bi serê xelkê de hatiye û tevî hemû dijwariyên jiyana xelkê li Îranê ki ji aliyê rêjîêma Îranê ve bi ser wan de hatiye sepandin, ez dûredîmena serkevtina xelkê bi ser rêjîma Komara Îslamî de ji hemû demekê nêzîktir dibînin.

# Mistefa Hicrî: "Li cografiya firenetewiya Îranê de bê pênasekirina pirsa serwerî, êdî nebe fikrê ji bihevrejiyana dixwaz bikin"

Deqa gotara Berpirsê Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat li simînara "Îran ji dîêtingeha Kurdan, rewşa Rojhilatê Kurdistanê û paşeroja Kurdan li Îranê de" li parlemana welatê Danmarkê:

Li destpêka sedsala bistê ve bi avakirina dewlet-netewyên serdest, pirsa netewî û pirsa dêmokrasî yê li cografiyaya Îranê, wek 2 pirsên bingehîn, hatine piştguhavêtin. Ev 2 mijar jî pirsa bingehîn a netewên jêrdest bûye.
Li mêzekirineke giştî de, xebat bo mafên netewwî û puirsên pêywendîdar bi azadî û kirameta mirov û jiyaneke serdemî, navenda pirsgirêk û rikeberî li navbera navendê û aliyên piştguhxistî de bûye. Herçiqas tepeserî û sitemkariya navendê li heyama desthilata 2 rêjîmên "Pehlewî û Komara Îslamî" berdewam bûye, lê nekariye xebata netewên bindest li pêxema bidest ve anîna mafê xwe kêmreng bike. Bervajî, hişariya siyasî û geşeya hizra netewî li asta herî bilind a xwe de ye. Belgeyên zindî bo vê îdiayê, tevgera "Jîna"ye ku bi dirûşma "Jin Jiyan Azadî", tevgera azadîxwazî ya netewên bê maf ber bi qonaxeke nû ve bir. Tevgera rijd ku li Kurdistanê de serî hilda û berfirehtirîn û taboşikêntirîn tevger li dijî navendê destpê kir.
Nasnameya netewa Kurd, mijarên wek ax, ziman, çand û dîroka hevpar bi xwe ve digre. Li ser vê bingehê, netewa Kurd îradeyeke giştî bo rizgarî û gihîştin bi serweriya siyasî li ser axa xwe hebûye. Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ekterek çalak û berdewam li meydana xebata netewî û rikeberî û berxwedana li hember navendê bûye. Qeware û çarçoveya hizrî û ev felsefeya ku ew hizbe li ser hatiye avakirin, li dijî her cure serberedayî û qurixkirin û dîktatoriyekê ye. Pêbendê bihevrejiyana aşîtîxeazane digel hemû pêkahetayan li ser cografiyaya Îranê ye. Netewên jêrdest bi hevpeymanê xwe yên bingehîn dizane û digel hemû hêz û aliyên azadîxwazên din ên Îranê ku bawera wan bi pirensîpên mafê netewî û dêmokrasîyê hebûye, pêwendiyên dostane heye. Ev hizbe ku avakirina vê li encama geşeya hizra siyasî û rêkxistina netewî bûye, hemû tekoşînên vê li pêxema bidestxistina mafê netewiyê Kurd li Îranê de bûye.
Hizba Dêmokrat li serdemên her duk rêjîmên Pehlewî û Komara îslamî de bi hizbeke neyasayî hatiye nasndin û berdewam li Îran û derveyî sînoran kirine armanca pîlan û gefên berdewam û curbicur. Ji destpêka şoreşa netewên îranê li sala 1979 de vê hizbê cehd kir ku bi rêya gotûbêj, çare-

dom»» R:6

# Mistefa Hicrî: “Li cografiya firenetewiya Îranê de bê pênasekirina pirsa serwerî, êdî nebe fikrê ji bihevrejiyana dixwaz bikin”

doma» R:5



seriyeke aşitîxwazane û dêmokratîk bo pirsa netewiya Kurd peyda bike. Lê rastî dengê “NE” ji aliyê desthilatdarên navendê hat. Heta gotûbêjên heyeta nûnerên xelkê Kurdistanê digel nûnerên Têhranê ti encamek nebû ku Hizba Dêmokrat jî li wê heyetê de endam bû. Dengê “NE”yê rêjîmê, siyaseta “şer li Kurdistanê” li pey xwe anî. Ayetullah Xumêynî, rêber û avakerê komara Îslamî, “fermana cîhad” li dijî netewa Kurd û tevgera vê ragihand.

Li encama siyaseta dijemirovî û qurixkariyên komara Îslamî de cografiyaya herêmên netewên jêrdest bi taybet Kurdistan, bi tevahî cografiyaya tepeserkirin û dagîrkeriyê bû. Sedema vê dijateîkirina digel Kurd û netewên din û îradeya berxwedan û sekinîn li hember navendê, divê ji her du aliyên xebat û tekoşîna berdewam a wan li qonaxên hestiyarên temenê komara Îslamî de bê hilsengandin û bê şirovekirin. Li heyama 45 salên desthilatdariya rêjîma komara Îslamiya Îranê, siyaseta tepeserkirin li asta daxwaziya mafê mirovê de hatiye birêvebirin.

Li herêmên xeyrî-fars de bi taybet li Kurdistanê, hemû şêwazên ewlehîkirina jiyan û siyasetên mirinê hatine bikaranîn da ku xelkê vê ji mafê xwe bêpar bin. Sîstema rêjîma Komara Îslamiya Îranê li ser binyata dijayetîkirin digel mafê netewî, azadiya gotin, azadiya olî û her cure hizreke siyasî ya cuda hatiye avakirin.

Bi taybet li vî heyamî de, netewa Kurd û cografiyaya Kurdistanê para herî zêde a komkujî, talankirina darayî û sereçaveyan, koçberiya bi zorê ya xelkê û cehd kirin bo guherîna dêmografiya Kurdistanê, jinavbirîna zimanê Kurdî li sîstema perwerdê de û înkara ola yarsan û givaşxistin bo ser oldarên sunnî û paremayî yê de hêlana bi zanebûn a aboriya Kurdistanê ber Kurdan ketiye.

Amara navendên mafê mirov li 45 salên derbasbûyî de bi rohnî dide xuya ku pêka heşîmetê, netewa Kurd zêdetirîn rêjeya bidarvekirin, girtin, dûrxistin, îşkence û gef bo ser jiyana çalakvanên mafê mirov û jîngehparêzan li Îranê de hebûye, wek mînak li sala 2023 de 839 kes hatine bidarvekirin, 119 kes ji wan Kurd bûne.

Kurdistan xwediyê çandeke çendalî ye û her ew bûye sedem ku mirov bi her cure hizir û bawerek û olekê, bi hev re bijîn. Lê siyasetên ne-dêmokratîkên rêjîma îslamiya Îranê li dijî civaka çend alî ya Kurdistanê ne. Kurdistan hertim daye xuya ku li derheq jinan, civakeke vekirîtir bûye û lewma bûye navenda serhildan a tevgera “Jîna Emînî” li sala 2023 de bûye. Tevgera “Jîna” bi dirûşma “Jin Jiyan Azadî” rewatî ji rêjîmê standiye, cehdkirinek bo jinavbirîna rêjîmekê bû ku li dirêjahiya temenê xwe, jin tepeser kirne.

Ev serhildane bi lezgînî û bi pêşengiya jinan û ciwanan, hemû nerizayetiyên li Kurdistan û Îranê kirine yekdeng û hevhizir ku heta rêjîm mabe, ti mirovek nikare xwediyê jiyaneke azad û xwedî rûmet be. Her çiqas ku li heyamê zêdetir ji yek salê tevgera “Jîna”yê de jî me dît, zêdetirîn kuştin, tepeserî û binçavkirin li Kurdistanê de bûn. Li Kurdistanê de heta niha jî çalakvanên mafê mirov û mafê ziman û jîngehparêz bi tawana piştevanîkirin li azadî û mafê jiyanê, têne bidarvekirin an hepsa demdirêj bi ser wan de disepînin û siza didin wan.

Ew sitema netewî, li binyatê de bi rêya danîna sînorên nevekhev li navbera naved û piştguh havêtiyan de tê kirin ku ji warê cografiyayî, siyasî, damezraveyî, çandî, zimanî, jîngehî û ayînî hene. Pênaseyek ku li Îranê de li derheq netewên din tê kirin, digel rastiya dîrokî, cografiyayî û siyasiya wî welatî cuda ye.

Em wa hizir dikin ku jinavbirina sîstimatîk a netewa Kurd, berdewamkirina siyaseta dagîrkarî, milîtarîzekirina jiyan û bêdengkirina dengên cuda û binpêkirina mafê mirov li Kurdistanê, ti rêyek bo me wek kurd nehiştiye ku em bikarin hizirê li ser sîstimeke siyasî bo Îrana paşerojê bikin ku li ser binyata yek netew yek ziman û yek ol hatibe avakirin. Rêjîma Îslamiya Îranê û her cure îdeolojiyek ku li ser binyata nasyonalîzma berçavteng hatibe avakirin, nikare pirsgirêkên Îranê çareser bike.

Em wek Kurd wa hizir dikin ku cografiyaya çendîn neteweya Îranê de bê şirovekirina pirsa serwerî li Îranê de êdî nikarin hizir ji bihevrejiyaneke dilxwaz bikin. Hekî biryar be sîstema siyasiya Îranê li paşerojê de li ser binyata serweriya neteweya Fars bi ser netewên din be, dîsan xeleka bê encama tepeserî û jinavabirînê dê dubare bibe ku têde netewên ne-fars bêpar dibin û ti binyatek bo dêmokrasiyê namîne.

Divê nîşan û binyatên Îrana paşerojê, ji nû ve bê şirovekirin. Ev yeka jî bê şik li herifandina serweriya navendê ve ber bi serweriya hevpar û mafê vekhev yên hemû netewên din tê kirin.

Şoreşa Jînayê wek bûyereke dîrokî ya çendînalî ji gelek waran ve bandor hebûye. Cudabûna rijdiya ya tevgera Jînayê ji adetên paremayî yên desthilata serberedayî, guherînên kûr li pey xwe anîne ku pêgeh û jêrxana guherîneke mezintir e. tepeserkirin renge bikare aliyê guherinan ber bi tundûtîjiyê ve bibe, lê nikare astengiyan bo çê bike.

Ev guherîna hizrî û binyatî li ser pêgeha ceribandin bi nirxên gelek giran li sitem û bêmafî û she bi nebûna kerametê pêk hatiye. Bo me yê Kurd, bi qasî armanca me bo herifandina komara Îslamî, bi vê qasê jî pirsa netewî û dêmokrasî, du hêlên bingehîn û pirensîpên neguher in. girîngtirt ji wane, derbasbûn ji hercure hizrîneke qurixkariyê ye ku bixwaze ceribandina rêjîmên paşatî û îslamî dubare bike.

Em daxwazê ji welatên azad û dêmokratîk dikin ku bo cihgîrbûna sîstemeke dêmokratrîk, li ser binyata mafên mirovî û nirxên azadî û dadperweriyê, alîkariya tevgera azadîxwaziya netewên Îranê bikin. Sîstemek ku bi derbasbûn ji paremayî, keramet bo jiyana take kesî û hemî wan netewan desteber bike.

## Nerîna



**“Mistefa Hicrî”:**

**“Mistefa Hicrî: Serhildana Jînayê wek bûyerek dîrokî a fire rihend di pir aliyan de bandor kiriye..”**



**“Nêçîrvan Barzanî”:**

**“Nêçîrvan Barzanî: Em ti carî dev ji azadiyê bernadin. ”**



**“Abram Pili” :**

**“Abram Pili: Xelkê Îranê nikarin li ser sandiqên dengdanê rastiyê bibêjin.”**



**“Matthew Miller”:**

**“Matthew Miller: Rêjeya kêm a beşdarbûnê di hilbijartinên Îranê de nîşaneke nû ya nerazîbûna giştî ye.”**

# Para me 45 salan belengazî bû, lewma baykot bi ser ket!



**N. Eskender Ceiferî**




Ji sala 1979’an ve heya niha 13 gerrên hilbijartinên serokkomariyê û 12 gerên hilbijartinên din li Îranê hatine encamdan. Di ti yek ji wan de ti Kurdekî nekarî bibe berendamê rastîn ji bo gelê xwe. Belkî sedemeke baykotkeran jî her ev be. Ji ber ku ew xwe, li Îranê xwedîmaf dibînin lê mafê wan hatiye zewtkirin.

Herî dawî rêjîma dagirkar a faşîstên Tehranê di baykota xelkê Kurdistanê de ji bo hilbijartinên gerra nû ya Meclîsê, desthilatdaran dîsa bersiva xwe ji xelkê wergirt.

Di hilbijartinên serokkomariyê de jî Kurdan hertim baykot dixiste ser rêjîmê.

Di 13 gerran de heft kes weke serokkomar hatibûn hilbijartin. Helbet desthilata wan sînordar e û nikarin tiştekê bêjin ku li gorî heza Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî nebe. Lê ya rast ev e ku ji bo Kurdan ferqê nake kîjan hilbijartin be. Ew di bin siya partiyên xwe de, tim di van salan de hilbijartinan baykot dikin.

Niha yekemîn hilbijartina piştî şoreşa Jînayê bû ku bi baykoteke berfireh, derket ku êdî qet rewatiya rêjîmê ji bo kesên girêdayî desthilatê jî nemaye.

Di salên di navbera 1979’an de heya 1981’an 2 kes bi navên Ebulhesen Benîsedr û Mihemedelî Recayî serokkomar bûn. Lê serokkomariya herduyan jî netemam ma. Sala 1981’an take sal bû ku du caran li wî welatî hilbijartinên serokkomariyê hatin encamdan. Sedem jî kuştina Mihemedelî Recayî bû ku tenê kêmtirî mehekê di wê postê de bû.

Piştî kuştina Recayî, Elî Xamineyî, Ekber Haşimî Refsencanî, seyîd Mihemed Xatemî û Mehmûd Ehmedînijad her yek du dewran serokkomar bûn. Tevî ku serokkomar li wî welatî piştî bidawîhatina dema çar salên xwe, car din bi hikûmetê re dimîne, lê Refsencanî û Ehmedînijad du ji wan kesan bûn ku piştî çend salan car din xwastin bibin berendam lê selahiyeta wan hate redkirin.

Di hilbijarinên sala 2009’an de zêdetirîn asta beşdariya xelkê ji aliyê wezareta Navxwe ve hatiye tomarkirin. Mehmûd Ehmedînijad wê demê karîbû tundrewan bikşîne aliyê xwe ve. Mîrhusên Mûsewî jî ku reformxwaz bû, karîbû bi hildana sloganên dêmokrasiyê ji bo guhertina rêjîmê, gelek dengan bi dest xwe ve bîne. Lê pişt re wezareta Navxwe ragihand ku navê Ehmedînijad car din ji sindûqan derketiye. Di wan hilbijartinan de zêdetirî 39 milyon û 400 hezar kesan deng dan ku dike 84 ji sedî kesên ku mafên dengdanê hebûn.

Di van 38 salan de gerra duyem ya serkeftina Refsencanî, xwediya kêmtirîn asta beşdariya xelkê di proseya dengdanê de bû. Di wan hilbijartinan de hinek zêdetirî 50 ji sedî kesên ku dikarîn deng bidin, dengên xwe bikar anîn.

Di destpêka avakirina Komara Îslamî de di yekemîn gerra hilbijartinan de 124 kesan navên xwe weke berendam tomar kirin ku piştî dayîna selahiyetan û vekişîna hin berendaman, 96 kesan hevrikî kir.

Gelek kesan tevî ku pêgeheke baş di nava xelkê de hebûn, lê nekarîn selahiyetê bistînin. Yek ji wan ku heya niha jî çarenivîsa wî nayê zanîn, Mesûd Recewî rêberê rêxistina Mucahidîn li Têhranê bû. Wî deng neda yasaya bingehîn û ji ber vê, Rûhulla Xumeynî got ew kafir e. Xumeynî li ser serkirdeyên Kurdan weke Dr. Ebdulrehman Qasimlû jî heman tişt got tevî ku di civaka Kurdistanê de xwediyê pêgeheke bilind bû.

Ebulhesen Benîsedir jî ku 78 ji sedî dengan bi dest xistibûn, ji aliyê parlamentoyê ve di bin givaşên Xumeynî de hate bê desthilatkirin û wî jî welat bi cî hêla û rewî ço Fransayê û her live jî mir. Tevî ku Benîsedr di şerê lidijî Kurdan de li pişta Xumeynî bû, lê di şerê Îran û Îraqê de pişta Xumeynî negirt û ev jî bû sedem ku meclis bi fermana Xumeynî wî ji posta serkomariyê bêxe.

Sadiq Qutbzade ku wezîrê derve bû bi tometa hewldan ji bo derbeya leşkerî hate darvekirin. Daryûş Firûher wezîrê Kar û Karûbarên Civakî bû, hate kuştin. Herduyan jî dixwast bibin berendamên serokkomariya Îranê.

Mîrhusên Mûsewî û Mehdî Kerûbî jî ku di hilbijartinên sala 2009’an de berendam bûn û beriya wê jî çend postên bilind di hikûmetê de hebûn, nekarîn bi ser Ehmedînijad de serkevin. Mûsewî û Kerûbî nerazîbûna xwe ji encamên dengan anîn ziman û alîgirên wan derketin kolanan û xwepêşandan kirin. Tevlîhevî çê bûn û ji wê demê ve ew di malên xwe de girtî ne.

Kurd dibêjin eger Dr. Ebdulrehman Qadimlo serkirdeyê şehîd ê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê û Fuad Mistefa Sultanî serkirdeyê Komelê bikariya berî ku bêne têrorkirin, mafê xweseriyê ji bo Kurdan ji Têhranê bistînin, dikarîbûn bibin berendamên serokkomariya Îranê jî. Ew dibêjin Komara Îslamî hewl dide hemû hêzên opozîsyonê, dijberên xwe û serkirdeyên wan jinav bibe. Fuad Mistefa Sultanî sala 1979’ an li nêzî gundê Bestam li ser riya di navbera Bane û Merîwanê de hate têrorkirin. Dr. Qasimlû jî sala 1989’ an li Viyen a paytexta Otrîşê ji aliyê têrorîstên Îranê ve hate terorkirin.

Lê piştî 45 salan, para Kurdan, hîn her belengazî ye. Lewma jî Kurdan vê carê jî, hilbijartinên rejîmê baykot kirin.

# Poz bilindiya desthildarên Komara Îslamî erdê girt



N: Hesen Mukerem

Herçawan ku behs dikin di sedsala 17`an a Zayînî de dema ku Wiam Harwi gera xwînê di nav laş de peyda kir û ji cîhanê re ragihand ku dil mîna pompekê ye û bi alîkariya çend boriyan yan heman demaran xwînê pal dide hûndrî laşê mirov de.

Xelkê wê serdemê ev tişta bi gelek ecêb didîtin û henekên xwe pê dikirin û li hember wê gotinê de rawestan û nedikarîn bawerî bi amûrek wiha bînin.

Lê, îro piştî vê ku zanista fîzyolojiyê berfireh bûye xelkê hinek amûrên din peydakirine ku gelek hûrtir û baştir li dil dixebitin, û bêguman kesên zana û pispor berdewam tiştê ji vê yekê ecêbitir di nav laş de peyda dikin ku dibe li cîhanê veşartî bin.




Niha desthilatdarên Spaha Pasdaran jî li hêz û hişyariya netewe û xelkê Îranê ecêb girtî mane ji ber ku bawer nedikirin ku dê bersivek wiha li şanoya hilbartinan de bidin wan.

Husên Selamî fermanderê giştî yê Spaha Pasdaran a terorîst di axavtinek xwe de ji xelkê re got her kes dibe bibe goriyê Spaha Pasdaran û Spaha Pasdaran nabe goriyê ti kesî.

Yan Elî Xamineyî ku berdewam gotinên xelkê nerazî dibhîstin ku naxwazin di şanoya hilbijartinan de beşdarî bikin û rewatiyê nadin bi cinayetên Spaha terorîst û jê natirsin.

Lê, Elî Xamineyî rêberê Welî yê Feqî ku xwe nûnerê Xwedê dihesibîne û dibêje peyam ji îlahiyat bo min tên û bi bihîstina gotinên nerazî yên xelkê Îranê dubare bi tundî û bi baweriyek tam got hûn çi beşdariya hilbijartinan bikin çi nekin emê her serbikevin.

Lê xelkê cesaret û hêza xwe nîşan dan şanoya hilbijartinan baykutkirin, bi taybet li bajarên Kurdistanê ku em di cesaret dikarin bibêjin tenê kesên ser bi rejîmê beşdarî kirin û sandiqên dengdanê vala bûn.

Rejîma mirovkuj û hov dubare bi poz bilindî û derevan asta beşdariya xelkê ji sedî 41 ragihandin lê ya rastî ji sedî 10 e û heta ev asta beşdariya xelkê di şanyoa hilbijartinan de ku rejîmê raginadiye dîsan liçav hilbijartinên berê pir kêm e û şikestek mezin e bo rejîmê û xûya kir ku êdî xelkê Îranê bi tevahî hemû neteweyên li Îranê hişyar bûne û derevên destlhatdarên rejîmê û hilbijartanên nedemokratîk yên Îranê qebûl nakin û daxwaza guherîna tevahiya rêjîmê dikin.

Herçend ku kesên girêdayî bi rejîmê bi fêl, gefxwarin ji malbatan û afrandina rikeberiyê dinavbera neteweyên bê maf de hewl dan ku xelkê neçar bikin ku beşdar bibin, lê xelkê bi cesart û bi yekdengiya seranserî bi beşdarî nekirina di piroseya dengdanê de bersiwek tund û bihêz dan bi pozbilindiya desthildatdarên rejîmê.

Desthilardar û berpirsên Spaha Pasdaran a terorîst ti carî bawer nedikirin ku dê xelk wiha yekgirtî û bihêz li hember wan bisekinin û poza van erdê bixin.

# Şano û nimayîşên rêjîma Îranê bi navê hilbijartinan



N: Azad Kurdî

Dema 45 salan e ku rêjîma Îslamî ya Îranê bi lidarxistina şano û nimayîşan her 4 salan carekê dixwaz raya giştî ya navdewletî bixapîne ku qaşo di vî welatê dîktator de hilbijartinan rêve dibe, lê ji xeynî şano û nîmayîş tişteke din nîne. Ligel vê yekê ku rêjeya beşdarîkirina xelkê di asteke herî kêm de ye di nav hemû pêkhateyên vî welatî de û bi taybet jî li Kurdistanê.
Demokrasî û bingehên demokratîk kultûreke pêşketî ye ku tolerans tê de gotina yekem dike. Çavkaniya hemû hilbijartin û biryaran gel e ku bi awayekî azad nûnerên rasteqîne yên xwe hildibijêrin û dibin parêzerên dengên dengderên xwe. Bê destnîşankirina berbijêran û destwerdana desthilatê hevwelatî azad in biryarên çarenivîsaz yên jiyana xwe ya siyasî bidin. Di civakên demokratîk de gel li pêvajoya hilbijartina pêvajoya siyasî ya welat diyarî dikin û nûnerên rasteqîne yên xwe bo hemû sazî û dezgehên dewletî didin û her 4 salan jî ev kesên hilbijartî dubare dikevin ber deng û lêpirsîna hevwelatiyan. Gel di demokrasiyê de biryarê li ser biryarên siyasî didin û dikarin her tiştî biguherînin.
Welatên Rojhilata Navîn ku ji rêjîmên dîktator û tundajo û oldar pêk tê, bi lidarxistina şano û nimayîşan qaşo nîşan didin ku hilbijartinan rêve dibin. Yek ji wan welatan Îrana dîktatorlêdayî ye ku keniya mirov tê bi şanoyên wan ên bi nav hilbijartinan Vala û betal ji hemû pirensîpên deokratîk. Rêjîmeke dîktator û îdeolojîk a Îslamî ya daxistî ku çi merc û bingeheke demokratîk tê de rêve naçe.
Ji roja rêjîma Xomêynî hatiye ser kar, li Îranê hemû partî û rêxistinên siyasî yên demokrat û pêşkevtinxwaz qedekirî ne, tiştek bi navê azadiya mediya û çapemeniyê nemaye, azadiya gotin û ramanê her nîne, girtîgeh tejî bûne ji rewşenbîr, çalakvanên siyasî, rojnamevanan û çalakvanên sivîl, pêkanîna tirs û xofê bûye çeka çavdêriya hevwelatiyan û … . Bi vî awayî jî tên bo xapandina raya giştî her 4 salan carekê şanoyên hilbijartinê rêve dibin ! Bi hemû tişekê diçin ji xeynî hilbijartinan.
Rêberê olî li gor qanûnên rêjîmê nûnerê xwedê ye li ser erdê û desthilatdarê sereke yê rêjîmê ye. Dezgehek bi navê Şêwra Nobedar pêk anîne ku kêrhatîbûna hemû kesên ku xwe berbijêr dikin bona wan şanoyan, divê erê bike. Kesên ku ser bi desthilatê nebin û nêzîk gel bin û bikarin berevaniyê ji maf û berjewendiyên hevwelatiyan bikin, qet nikarin mafê xwe berbijêrkirinê bidest bixin. Rêjîm bo serokkomariyê û nûnerên meclîsê mohreyên xwe destnîşan dike û di çarçoveya şano û nimayîşên bi nav hilbijartinan de bi dengdana nimayîşî rewatiyê bo wan werbigire. Kesên ku ji filterên rêjîmê derbas dibin, tenê dibin parêzerên berjewendiyên rêjîmê, ne daxwazên mirovî û demokratîk ên gel.



# Pirsgirêkên girêbesta civakî di civaka Urmiyê de



N: N. Elî Munezemî

Girêbesta civakî di Rojhilata Kurdistanê de bi giştî, di herêma Bakûrê Rojhilatê Kurdistanê û bi xasma bajarê Urmiyê de, bi sedema dagîrkariya Îranê û cihêrengiya xelkê hêşta xîmê wê livok e nekariye hemû qetên civakê bi hev ve girêbide.

Ewê yekê di dema propagandayên bo hilbijartina parlemana rejîmê di bajarê Urmiyê de zêdetir xwe nîşan da gava ku hindek berbijêrên turkên azerî di axaftinên xwe de hêrîş kirin ser kurdan û ew bi «mêvan û koçber» binav kirin û ewê yekê jî pêlek bersivên kurdan yên tund pey xwe re anîn û kurdan jî azerî bi «paleyên kirêçî» û «xwêfiroşên bi barê kera» binav kirin.

Gelo sedemên wan çalakî û bertekan çi bûn û çi ne?
Wateya girêbesta civakî dikare pirreng û girêdayî bi wê xalê be ku mirov tê re bera xwe dide meselê. Bo mînak yek dikare bibêje ku girêbesta civakî peymaneke bo hemû hemwelatiyan, Lê yekî din dikare bêje ku peymana civakî hizr û ezimûneke bo wê yekê ku rêkxistin û saziyên bingehîn yên di civakê de çawa dibe bêne dîzaynkirin. Yan yekî din jî bêje ku girêbesta civakî têgihiştinek berfireh a mafên hemwelatiyan yên bingehîn û erkên hevbeş ên li hember hev, wekî hemwelatiyên wekhev e.

Gava ku em mêzeyê wan her sê nimûna dikin, dixûye ku girêbesta civakî li civakeke wek a bajarê Urmiyê de, xîmê wê li ser cemedê ye û pirsgirêk an gotinek piçûk dikare bertek û reaksiyonê mezin li pey xwe ve bîne û berjevendî û qazancê hemû deste û grûpan bi hev re bişevitîne.

Esasa wê yekê jî dizivire bo siyaset û pîlanên dagîrkarane a rejîma Îranê ku li pêxema parastina serdestiya xwe û neteweya serdest de, civak polarîze kiriye li ser cemserên dij hev heta ku hêsantir bikare wan kontrol bike û wan li bindestiyê de bihêle.

**Xelkê Urmiyê bi kurd û azarî ve biryar dabûn ku di wê gera hilbijartinên parlemanî a rejîma melayan de pişikdar nebin. Lê li ber ku rejîm bikare xelkê bikşîne ser qotîyên dengdanê, kete gerandina pîlanan li rêka mohre û kirêgirtiyên xwe ve.**

Bo mînak di wan herêmên ku kurd û azerî bi hev re tê de dijîn, ewan saziyên desthilatdariyê wisa awa kirine ku têde azerî li ser kurdan de serdest bin û fars jî di ser azeriyan de.

Kurd li ber ku di jiyana xwe ya rojane de tevî karbidestên azerî dibe alî, ji bîr dike ku azerî jî bi xwe bin destê dagîrkerên fars de ye û dibe kurd û azerî bi hev re alîkar bin bo herifandina serdestiya neteweya serdest.

Li hember de jî azerî ji bîr dikin ku bindest in û ew dibe tewî kurdan alîkar bin ku her du alî xwe li bindestiyê rizgar kin.

Pêdivîye rewşenbîr û siyasiyên herdu neteweyan zêdetir li ser wê pirsê berçavronîyê bidin xelkê xwe û wan li wê dijberiya ne ber bi aqil biparêzin û bi wan bidin zanîn ku azadî û rizgariya herdu neteweyan li hevkarî û hevxebatiyê de ye û ew yeka li aliyê nifş û rêberên berê, bi xasma li serdema komara Kurdistan û Azerbaycanê de bi başî hatibû famkirin û encamdan.

sazî û rêkxistinên civakî yên bingehîn wisa hatine dîzaynkirin ku ne tenê di xzimeta hemû hemwelatiyan de nîn in, belke bi xwe hereşe ne bo ser parek zaf a hemwelatiyan û erk û mafên wan yên bingehîn binpê dike.




Li hêlekê mohreyên sîxur-pasdarên xwe yên azerî û li hêla din ve jî caş û xwefiroş anîne meydanê û bi afirandina atmosfereke nexweş di navbera kurd û azerîyan û di navbera eşîran de, karî ew zeliqoka civakî tenik bike û hindek kesan li herdu aliyan bêxe xizmeta armancên xwe yên siyasî.

Başe gelo kurd û azerî çima û çawa li aliyê rejîmê ve têne xapandin? Bersiva wê pirsê hem hêsan û hem jî gelek dijvar û zehmet e.

**Karbidestên Îranê bo parastina serdestiya xwe û neteweya xwe sîstemeke hiyerarşîk di navbera neteweyên bindest de afirandine ku ewan bi hêsanî dike dijberê hev û dêxe xizmeta neteweya serdest de.**

**Li hember de cehd dikin ku kurdan li bindestiya xwe de bihêlin û hemû cehd û xebata wan bo hindê ye ku kurd negihîjin bi azadiyê. Li ber wan hizr û têgihîştina xelet û çevt, her 2 aliyên kurd û azerî rikê ji hev digrin û ew bonda civakî di navbera wan de lavaz û qels dibe.**

Ew yeka jî fersendê dide farsan ku wan tepeser bike. Yanî her sê mînakên me li ser girêbesta civakî li jor bas kirin, bi hev re namînin.

Li hêlekê girêbesteke civakî bo hemû hemwilatiyan tine ye, li hêla din jî

Her wisa erka rewşenbîr û nifşa nû a kurd e ku nehêlin bi seha eşîritî bêne xapandin û dibe bizanin ku ew tiştа ku me hemûyan bi hev re girê dide û pêşeroja me ronahî dike, kurdbûna me ye. Em dibe cehdê bikin ku li serdema hizr û ramanên eşîretî derbaz bin.

Li ber ku serdema nû şêveyeke nû a jiyan dixwaze ku çarçoveya eşîretî bo teng e. Nabe ku kes xwe bike fîda bo hizrên eşîretî.

Pêşeroj yê di berjewendiya neteweperwer û welathezan de be. Em li ser wê bingehê girêbeseteke xurt a civakî-Kurdistanî awa bikin ku hemû pêkhateyên kurdistanê xwe tê de bibînin.

# 8’ê Adarê roja rêzgirtina ji berxwedaniya jinê ye



**N: Mojgan Elîpûr**
**W: Hesen Mukerem**




8’ê Adarê di sala 1857’an a Zayînî de bi hilkevta Xwenîşandana mezin a Karkerên Jin ên li Karxaneyekî Karkeran li Amerîkayê hate gorê. Di sala 1977’an a Zayînî de bi pêşniyara xebatkara jin Clara Ztkin, Neteweyên Yekbûyî Roja Jinan a Cîhanê ragihand.

Ev roj ji bo rêzgirtina têkoşîna jin û çalakiyên curbecur tên lidarxistin û jin ji bo îfadekirina daxwaz û daxwazên xwe derfeteke mezintir bikar tînin.

Li Îranê bi dehan salan piştî biryara Neteweyên Yekbûyî, jin hîna jî nikarin ku bi awayekî fermî vê rojê bibîr bînin û ev roj weke hilkevtekê cihê xwe bigire.

Her çend yekemîn çalakiya jinan a li dijî hicaba bi darê zorê di 8’ê Adarê de hat lidarxistin, lê nekarî bibe çalakiya jinan û bi dehan jin ji ber vê çalakiyê hatin girtin û rejîma li dijî jinê ya Îranê jin ji vê raya giştî bêpar hiştin.

**Her çend li Îranê astengiyên li pêşiya xebatên jinan bi qanûnê hatin astengkirin û jinên îranî mîna jinên din ên cîhanê nikarîbûn mafên xwe biparêzin, lê givaş û zordariyan nekarî bi tevahî van xwestekan bifetisînin û di qonaxên cûda û di çalakiyên curbecur de derket holê.**

Li gel hebûna desthilatdariyeke dîktator li welat, pirsgirêka jinê di warê hişmendî û mezinbûnê de qonaxeke girîng derbas kiriye, bûye mijarek ku rejîma dîktator a Îranê hertim pêve mijûle û li cehda tepeseriyê de ye.

Jinên Kurd ên ku berî hatina Komara Îslamî ya Îslamî dest bi têkoşîna xwe ya ji bo bidestxistina mafên xwe kiribûn, pir zû hayl naveroka rejîmê bûn û tu carî pabendî yasa û biryarên rejîmê nebûn, wan qadên şer ên curbicur ên têkoşînê li hundir û derveyê Îranê geş kirin.

Ji bo vê armancê gelek qurbanî dane. Jinên kurd carek wek jin û carek jî wek kurd neçar man li hember dîktatorên Îranê berxwe bidin.

Di nava partiyên Rojhilatê Kurdistanê de ji bo bidestxistina mafên neteweyî tevlî hêzên Pêşmerge bûn, tevî zehmetiya vê rêyê ji bo jinan jî, li kêleka mêran derketine û di nava partiyan de derbasî asta biryardayînê bûne.

Tevî ku hebûna jinan di asta jor a partiyan de têra,bersivdayîna rewşa heyî nake jî, lê kariye rengê tarî yê serdestiya mêran heta radeyekê baş kêm bike û şopa tiliyên jinan di kar û barên siyasî de nîşan bide û di nezima cîhanê de dereng neke.

**Têkoşîna ji bo wekheviya jinên Kurd xwedî dîrokeke geş e û ev nêzî sedsalî ye didome û di sala 1945’an a Zayînî de bi damezrandina Partiya Jinên Demokrat a Kurdistanê ji aliyê yekemîn hikûmeta Kurdistanê û Pêşewa Qazî Mihemed ve bi fermî dest bi têkoşînê kir.**

Ev têkoşîn her çiqas di qonaxên têkoşîna gelê Kurd de hêdî bû jî, bi awayekî berdewam bûye û piştre jî li vê pêxemê de ji aliyên cuda ve li hûndrî partî û li hûndrî Îranê li şaxên din wek tak têkoşiya ye.



Tişta ku lawaziya têkoşîna jinan li Îranê bi taybetî li Rojhilatê Kurdistanê bûye pirnetewebûn û hebûna baweriyên cuda, lê eger li welatekî demokratîk bûya û derfeta têkoşîna jinê ya azad hebûya, wê encamên cuda bibûya û ev cihêrengî dikaribû têkoşîna jinê dewlemendtir bikira, lê ji ber ku wan tu carî nekariye bi serbestî û li dora heman tiştî bixebitin, ew hêz û pontansiyel tê dabeş kirin, her kesî ji hev cuda cehd kiriye, lê me nekariye dengê yekgirtî ji bo daxwazên jinên Îranê bidest bixin, ku ev yek ji bo tevgera jinan li Îranê ziyanek e du hember e.

Bi heman awayî di tevgera jinên Kurd de dabeşkirina jinan di nava partî, rêxistin û aliyên cuda de, li rojhilatê Kurdistanê weke têkoşîneke yekgirtî nayê dîtin, tevî ku hewldanên di nava rêxistinên girêdayî partiyan de û heta li malê jî ji aliyê jinan ve dewam dikin, hîna jî zimanek ku femînîzmê di nava Kurdan de pênase bike, nîne.

Lê ya ku divê were nîqaşkirin û weke xala zivirandina tevgera jinê ya li Îran û Rojhilatê kurdistanê, ew e, serhildana Jinê û Tevgera “Jin, Jiyan û Azadi”yê bû ku tevî pirsgirêkên belavbûyî di nav civaka Îranê de, karîbûn ji bo her kesî, bi taybetî jî pirsgirêka jinan, bibin xala hevgirtinê, helbet roja şehadeta Jîna yê û destpêkirina wê serhildanê wê di têkoşîna jinê de bibe rojeke dîrokî wek 8`ê Adarê.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Li girtîgeha Urmiyê de, Garda taybet êrîş kirie ser girtiyên siyasî

Piştî nivîsa nerizayetî ya 800 girtiyan li girtîgeha rêjîmê li bajarê Urmiyê bo guherîna serokê vê girtîgehê, hêza garda taybet a vê girtîgehê, êrîş kire ser benda siyasî ya vê girtîgehê û ew kutane.

Pêka rapora Rêkxistina Mafê Mirove Kurdistanê roja Çarşemî 9ê Reşemeya 1402 a Rojî, piştî belavbûna nameya nerizayetî ya zêdetir ji 800 girtiyên li vê girtîgehê û nûçeya canjidestdana binçavkiriyê siyasiyê Kurd "Şahîn Geledar", garda taybet bi fermana "Pêyman Xanzad" serokê vê girtîgehê, êrîşkirine ser benda siyasî û eqîdetî û girtiyên li vê bendê bi dijwarî kutane û alav û tiştên wan şikandine

herwisa li vê êrîşê de derbên giran bi serê 5 girtiyan kevtiye û birîndar bûne û 2 girtiyên Kurd ên bi navê "Eşkan Osmannijad û Hesen Omerpûr" jî agir berdane xwe ku pêyên wan şewitiye û serokê girtîgehê derfet nedaye ku wî agirî bitemirînin û derê bendê daxistiye û nehiştiye ti kes bo beşa dermanî ya girtîgehê bê veguhastin.

Li vê êrîşa hovane de berpirsê vê bendê"Yehya Sultanî û "Pêyman Xanzad" jî amade bûne û navbirî gotiye: "min ti tirsek li çi navendeke navnetewî heta Saziya Netewên Yekgirtî jî nîne, ez her karekê bixwazim dê bi serê wan girtiyan de bînin".

Bi sedema givaşên wî berpirsê hov ê girtîgehê, niha zêdetir ji 10 girtiyên ku hewla xwekujiyê dane li navendên dermanî li derveyî vîê girtîgehê de ne.




## Rêjîma Îranê bi sedema çalakiyên li derheq baykota hilbijartinê, sedan kes girtine

Rojekê berî şanoya hilbijartina rêjîmê, werzişvanekî temen 18 salî yê bi navê "Mardîn Gencî" ku li ser tora civakiya "Instagarm"ê rexne ji "Mihermedresûl Şêxîzade", berboijêrê meclîsa rêjîmê girtibû, ji aliyê hêza îtilaat a spaha pasdaran a tirorîst ve li mala xwe de hate binçavkirin û bo ciheke nexiya hatiye veguhastin.

Herwisa rojekê berî şanoya hilbijartinê li Urmiyê de pitir ji 50 kes ji çalakên medenî û civakî bi sedema danana postên ku li hilbijartinê de beşdar nabin, ji aliyê hêzên ewlehiyê ye rêjîmê ve hatine binçavkirin û heta niha qedera wan nerohne.

Herwisa li piraniya bajarên Rojhilatê Kurdistanê rêjîmê reşbigîriyekî berfireh destpê kiriye û çalakên li ser torên civakî girtine.

Roja hilbijartinê jî li piraniya nawçên Kurdistanê de, rêjîmê bi armanca evê ku dîmen û vîdeo yên baykotê û çoliya binkên dengdanê negehne ser torên civakî, tora Întirnêtê qut kiribû, yan hinde lawaz kiribû ku kesê nedikarî heta bo pêywendiyê jî mifahê jê wergire.

Li asta seranserî de jî, dehan û belkî sedan kes ji çalakên medenî û siyasî û civakî û kesayetiyên xuya ku bi aşkera basê baykotê dikirin, yan rexne ji deshilat û sîstima rêjîmê digirtin, hatine destbiser kirin, ku di nava wan de kesê deshilatdar yên rêjîmê, Axund, Mamostayên Zanîngehan jî hene.



## Kolberekî xelkê Tîkabê ji aliyê rêjîma Îranê ve hate kuştin

Hêzên sînorî yên rêjîma Îranê li sînorê "Serşîv"ê ser bi bajarê Seqizî, teqe li kolberekî xelkê bajarê Tîkabê kirin û ew kuştin.

Pêka rapora "Kolbernews"ê, sibêdeha roja Yekşemî 13ê Reşemê, Hêzên sînorî yên rêjîma Îranê li sînorê "Serşîv"ê ser bi bajarê Seqizî, bê agehdarkirina berê û bi awayê rasterast teqe li kolberekî xelkê bajarê Tîkabê yê bi navê "Elî Zerxamî" kirin û ew kuştin.

Pêka vê Raporê "Elî Zerxamî" yê temen 52 salî û xelkê gundê "Sarîbax"ê ser bi bajarê Tîkabê û bavê 3 zarokan e û gulleyên hêzên sînorî yên rêjîmê bi zikê vî kevtine ku li encam de canê xwe ji dest daye.



# Agirî

◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (465)


